## Bermahîkên girse û gir / Bermahîkên daran (Hundir)

Mobel û kelûpelên gir an giran ên mala we ji bermahîkên gir in. Hûn dikarin vana û bermahîkên darên hundirîn ên malê bibin navendên jinûve-vegerandinê yên bajarî. Li wir heta çar metrekûp û heta nîvê sale anegorî her malbatekê bi awayê belaş tên wergirtin. Her wiha hûn dikarin bi rêya malpera xwarê daxwaz bikin ku kelûpel ji mala we werin komkirin ( www.dresden.de/abfallformulare an jî bi rêya forma siparîşê werin radestkirin). Ev xizmet heta çar metrekûp û di nîvê sale de ji bo her malbatekê heye û dive lêçûna wê were dayîn. Ji bo xwediyên pasportê li Dresdenê, berhevkirna ji bo her malbatekê carekê di sale da belaş e.

## Bermahîkên alavên elektrîkî

Hûn dikarin bermahîkên alavên elektrîkî bi awayê belaş radestî navendên jinûve-vegerandinê yên bajarî bikin. Alavên mezin bi vê wateyê ye ku aliyekî wê herî kêm 50 cm dirêj e, hûn dikarin her nîvê salê carekê ji mala xwe radest bikin (Daxwaz li Înternetê li adresa www.dresden.de/abfallformulare oder an jî bi rêya Karta Siparîşê). Ji kerema xwe bila haya we hebe ku ev xizmet ji bo her parçeya mezin a bermahîkên alavên elektrîkî, bi lêçûn e. Tevî vêya, hûn dikarin bermahîkên alavên elektrîkî yên biçûk bi awayê belaş radest bikin.

## Materyalên ziyandar

Materyalên ziyandar pêkhatî ji hin madeyan in ku zirarê digihînin jîngeh an tenduristiyê û ji ber vê yekê li ser pakêta wan nîşana xeterê heye. Ev matyeryal wek mînak madeyên paqijker, dezenfekteker û afetkuj, paqijkerên laka neynokan, germapîvên qerqeşûmê, qutiyên spriyê yên nîv-vala, rengên şilekî, baterî, bateriyên şarjbar û rûnê matorê û rûnê patinê ne. Hûn dikarin heta 25 lîtreyan li navendên jinûve-vegerandinê yên bajarî (ji bilî Leuben û Loschwitzê) radest bikin. Yan jî hûn dikarin van bermahîkan bîn navendên berhevkriina materyalên ziyandar ên gerrok ku li bihar û payîzê ji Dresdenê derbas dibin (roj û cih li vê adresê hene: www.dresden.de/schadstoffmobil). Radestkirin belaş e.

## Zibilên kesk

Bermahîkên têkildarî kurtkirina çîmenê, kesixandina daran û deviyên dora kolanê, giyanên pirrpar, giyanên kevn, pel, ax û drên Krîsmesê Bermahîkên Kesk in. Hûn dikarin wan bibin navendên jinûve-vegerandinê yên bajarî û navendên berhevkirinê yên li dorhêla bajêr. Radestkirina wan bi lêçûn e. Hûn dikarin Dara Krîsmesê ya xwe ji dawiya Kanûnê heta dawiya Çileyê bi belaşî radest bikin. An jî hûn dikarin wan bibin navendên berhevkirinê ku piştî Krîsmesê li bajêr tên damezirandin.

## Zanyarî û Şêwirîn

- Telefonaa Zanyariyên Bermahîkan:
  (03 51) 4 88 96 33 (Duşemî-Înî saet di 8-12 de, Sêşemî/Pêncşemî saet di 13-17 de)
- E-Mail: abfallberatung@dresden.de
- www.dresden.de/abfall

**Hûrgiliyên weşîner**

Weşîner
Bajarê Dresdenê yê navenda eyaletê

Amt für Stadtgrün und Abfallwirtschaft
(Rêveberiya Atmosfera Kesk a Bajêr û Rêveberiya Bermahîkan)
Abteilung Abfallwirtschaft/Stadtreinigung
(Beşa Rêveberiya Bermahîkan/Paqijiya Bajêr)
Telefon (03 51) 4 88 96 33
E-Mail abfallberatung@dresden.de

Amt für Presse-, Öffentlichkeitsarbeit und Protokoll
(Rêveberiya Çapemeniyan, Peywendiyên Gelemperî û Protokol)
Telefon (03 51) 4 88 23 90
E-Mail presse@dresden.de

Sindoqa Postê 12 00 20
01001 Dresden
www.dresden.de
facebook.com/stadt.dresden
instagram.com/landeshauptstadt_dresden

Hejmara telefona îdarî ya navendî 115 – Em pirsan meraq dikin

Adara 2024an

Belgeyên elektronîkî yên xwedan wajoya elektronîkî yên xwedan merc bi rêya formekê dikarin werin radestkirin. Hr wiha derfeta şîfredarkirina E-Mailan bo bajarê Dresdenê yê navenda eyaletê bi sertîfîkayeke S/MIME an şandina E-Mailên ewleh bi DE-Mail'ê heye. Zanyariyên zêdetir di vî warî de li ser adresa www.dresden.de/kontakt. Ev belgeya ragihandinê ya beşeke xebata peywendiya gelemperî ya bajarê Dresdenê yê navenda eyaletê ye. Bikaranîna wê ji bo reklam û promosyonên hilbijartinê rêpêdayî nîne. Halbûkî, partî dikarin ji bo haydarkirinha endamên xwe jê sûd wergirin.



# Cidakirin û wêdadayîna bermahîkan

Wêdadayîna bermahîk û zibilan bi awayê cidabûyî dibe alîkar ku em piştrast bibin ew dikarin bên jinûve-vegerandin an bi duristî werin wêdadayîn. Ev kar çavkanîyan û jîngehê diparêze. Bo vê meremê gellek bijarde hene.

## Feraqa zibilan

Wêdadayîna bermahîkan bi awayê cidabûyî li nav satil û zibildankên cûrbicûr çêtir e anegorî bikaranîna zibildankên bermahîkan. Ji bo we, zibuildankên xwarên li mala we hene:

- Satila şîn: Ji bo kaxez û kartonan
- Satila Biyo (Biyo-Bermahîk): ji bo bermahîkên biyo û kesk
- Satila zer/Telîsa Zer: Ji bo zibilên pakêtkirî yên sivik
- Satila bermahîkan: Ji bo zibilên mayîn

## Feraqa jinûve-vegerandinê

Li bajêr gellek cih ji cîgehên ji bo jinûve-vegerandinê hene. Hûn dikarin pakêtên vala yên şûşeyî li wir dayînin û hema bêje di nîvê wan de kaxez û kartonan dayînin. Ji kerema xwe haya we jê hebe ku ji ber xirecir û dengan, danîna şûşeyan tenê di hin demên taybet de pêkan e.

## Cihên berhevkirina materyalên vegerbar ên bajarî

Li navendên jinûve-vegerandinê yên bajarî, hûn dikarin bermahîkên ku li nav satilên zibilê û feraqê jinûve-vegerandinê cih nagirin, radest bikin. Hûn dikarin navnîşan û saetên xebata wan, her wiha zanyriyan li ser tiştê ku li wir qebûl dikin, li adresa www.dresden.de/wertstoffhof bibînin.

Hûn dikarin vana bi awayê belaş radest bikin:

- Heta çar metrekûp bermahîkên mezin û bermahîkên daran (ji nav qadê) anegorî her malbatêû di nîvê sale de
- Heta 25 lître materyalên lewitîner, qutiya fom a Montajê PUR (ji bilî Leuben, Loschwitz)
- Baterî/Bateriyên Şarjbar
- Bermahîkên alavên elektrîkî, lampeyên LED / Lampeyên Kêm-mesref, boriyên Florsent
- Bermahîkên nav male (ji bilî bermahîkên erebeyê)
- Tiştên çêkirî ji plastîkê
- CD/DVD, Kaseta Vîdyo
- Pakêta Kaxez, Karton, Şûşe
- Kinc û solên Destê Duyem
- Kartrîcên Çapker ên Vala/Kartrîca Toner
- Pel û çiqlên darên kolanê û bermahîkên madeyên madenê
- Darên Krîsmesê ji dawiya Kanûnê heta dawiya Çileyê

Bi dayîna lêçûnê, hûn dikarin vana radest bikin:

- Zibilên kesk
- Bermahîkên tekerên erebeyan/Bêyî Rîngê
- Bermahîkên madenî yên avahîçêkirinê heta deh lîtreyan li Leuben û Plauen'ê û heta 500 lîtreyan li Friedrichstadt û Reick
- Kepsola Agirvemirandinê
- Peldanka heta 20 Parçe anegorî her malbatê (Ji bilî li Leuben, Loschwitz, Plauen)

# Çi tiştek dikeve nav kîjan satila bermahîkan?

## Satila bermahîkên nevegerbar




- Alavên Paqijiyê: Pûşek û paçik, Paqijkerê Guh, Astera Derpî, Tampon, Kaxezê Şil/Destmala Şil, Destmala Destavê ya Şil
- Ax, telîsên Gêziya Elektrîkî, Xweliya Sar (Arî), Binê Cîgareyê
- Derman
- Her nivîna pisîkan, Pîsatiya ser li nav telîsê, Pîsatiya heywanên biçûk tev li axê
- Berhemên şûşeyî, çînî, seramîk, krîstal/neynik/şûşeya pencereyê (hejmara hindik)
- Hestî, hestiyên masiyan, goştê xav
- Kaxezê dîwar û mafûrên biçûk
- Bermahîka reng/bermahîka lak
- Tekstîlên xerab û solên kevn, çerm/kelûpelên çermê çêkirî
- Duçerxe/ tekerên biçûk

**Ne li:** ✗

- Bermahîkên alavên elektrîkî, lampeyên LED / Lampeyên Kêm-mesref, boriyên Florsent
- Madeyên ziyandar, baterî/bateriyên şarjbar
- Bermahîkên gir/bermahîkên daran (qada hundirîn)
- Bermahîkên navmalî

## Satila biyo-bermahîkan




- Bermahîka xwarin û rijandiyên xwaremendiyan ji ber aşpêjiyê
- Xwaremendiyên hilgirtî an xerabûyî (bêyî pakêtê)
- Brmahîka qehweyê, çay (bi parzûna kaxezî/kîsika kaxezî)
- Bermahîkên kesk ên mal û baax: Gulên permûçbûyî, giyayên guldankî, piçekî axa guldankê, pel, giyayên berhevbûyî ji ber kurtkirina çîmenê, çiqlên kurtkirî
- Pîsatiyên heywanên biçûk li nav giya û riwekan: Pirtikên hûrbûyî yên daran û ûnce
- Piçekî çewriya xwarinê/rûnê patinê yê hilmijandî li kaxezê mitbexê

**Têbînî û amaje:**

Bermahîkên biyo yên çil li kaxezê aşpêjxaneyê an kaxezê rojnameyê bipêçe. Ev kar dibe sebeba kêmbûna bêhnê û rêgirtin li qerisîna feraqê.

**Ne li:** ✗

- Telîsa bermahîkan a plastic/ telîsa zibilan a pakêtkirinê, biyoplastîkên dikarin bên kompostkirin
- Destmala kaxezî, pûşek
- Hestî, hestiyên masiyan, goştê xav
- Her nivîna pisîkan

## Satila Zer/ Telîsa Zer




- Pakêtên vala yên madeyên çêkirî: Botriya Şampûyê-/ Botriya madeyên şûyer, feraqa mstê-/feraqa biharatê, satila reng, telîsên plastîk, paleta giyayî, borî, postika kremê
- Pakêtên metalî yên vala: Qutiya konservê/qutiya reng/ qutiya spriyê, derê botriyê, sînika alûmînyûm/foyl/derê almînyûm
- Pakêtên vala yên çêkirî ji materyalên bihevve-girêdayî: Kartona vexwarinê, lîsika sûpê, pakêta vekyoma mêweyan, pakêtên hebên dermanî
- Materyalên pakêtkirinê: Qalikgirtin û tiraşeyên fom, dapûça zîpikdar

**Têbînî û amaje:**

Hûn dikarin bermahîkên plastic/ metal radestî navendên jinûve-vegerandinê yên bajarî (ji bilî bermahîkên erebeyê) bidin.

**Ne li:** ✗

- Berhemên plastic/berhemên metal: Tas, feraqên hilgirtina xwaremeniyan, Qutiyên avdanê, guldank, kêr, çetel, bêjing
- Qutiyên spriyê yên valanekirî, qutiyên foma montaja PUR
- Kaxezên bermahîk, şûşeya pakêt

## Satila şîn




- Rojname, kovar, belavok, pirtûk
- Kaxezê nivîsînê/kaxezê boyaxkirinê/kaxezê kopîkirinê
- Kaxezê qermiçandî/kaxezê pakêtkirinê/kaxezê xelatê
- Karton û pakêtên hûrbûyî

**Têbînî û amaje:**

Karton û pakêtan beriya wêdadayînê, hûr bikin. Bi vî rentgî, qaseke zêdetir li nav feraqan cih digire. Hûn dikarin kartonên mezin radestî navendên jinûve-vegerandinê yên bajarî bikin.

**Ne li:** ✗

- Kaxezê bermahîk ê çewr an rûkeşkirî: Kaxezî patinê/ kaxezê ardê nên, pakêta Pîzayê
- Kartona vexwarinê, telîsa sûpê
- Destmala kaxezî/xawliya aşpêjxaneyê
- Wêne, poster, kaxezê dîwarî

# Çi tişt dikeve nav kîjan satila jinûve-vegerandinê?

## Kaxezên bermahîk




- Rojname, kovar, belavok, pirtûk
- Kaxezê nivîsînê/kaxezê boyaxkirinê/kaxezê kopîkirinê
- Kaxezê qermiçandî/kaxezê pakêtkirinê/kaxezê xelatê
- Karton û pakêtên hûrbûyî

**Têbînî û amaje:**

Karton û pakêtan beriya wêdadayînê, hûr bikin. Bi vî rentgî, qaseke zêdetir li nav feraqan cih digire. Hûn dikarin kartonên mezin radestî navendên jinûve-vegerandinê yên bajarî bikin.

**Ne li:** ✗

- Kaxezê bermahîk ê çewr an rûkeşkirî: Kaxezî patinê/ kaxezê ardê nên, pakêta Pîzayê
- Kartona vexwarinê, telîsa sûpê
- Destmala kaxezî/xawliya aşpêjxaneyê
- Wêne, poster, kaxezê dîwarî

## Pakêtaşûşeyî




- Pakêtên botriya şûşeyî ya vala: Vexwarin, rûn, sîrke, sos, perfûm
- Pakêta şûşeya vala ya konservackungen für Obst, Gemüse,mêweyan, pincar, rîçal, sprî, sos, avgoşt

**Têbînî û amaje:**

Feraqek ji bo pakêtkirina şûşeyî ya kesk, qehweyî û sipî heye. Rengên din li nav feraqên şûşeyî yên kesk cih digirin.

Ji kerema xwe bala xwe bidin ser demên bikarhanînê: Duşemî heta Şemiyê saet 7 heta 20

Şûşeyên pakêtkirinê yên gellekî gir, her wiha berhemên şûşeyî yên eramîkî li satila bermahîkan a mayî cih digirin.

**Ne li:** ✗

- Berhemên şûşeyî: Çaydank, perdaxa şûşeyî, guldank
- Çînî, seramîk, axînî
- Krîstal/neynik/şûşeya pencereyê
- Lampeyên LED/Lampeyên kêm-mesref, boriyên florsent